

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar ( 134) Sal 22 Rezber 2017 z - 2629 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (75)L.S

# Hilbijartinên Hevserokatiya Komînan

## Bi Erênî Bi Rê Ve Çû

**Desteya sernivîser**



Li roja 22.9.2017an, li ber roniya biryara kongireya Rimêlanê ya Encûmen damezrênerî ya Federaliya Demokrat a Bakurê Sûriyê, dest bi hilbijartinên hevserokatiya komînan-pêngava yekemîn ji sîstema Federaliyê- di her sê herêmên Federaliya Bakur (Cezîr, Ferat û Efrîn) de bû û encamên hilbijartinê bi awakî fermî ji aliyê komîsera bilind ya hilbijartinan ve hate ragihandin. Di hilbijartinên derbasbûyî de, piraniya şert û mercên ku di lîsteya cîbicîkirinê ya hilbijartinan a ku ji aliyê komîsera bilind a hilbijartinan ve hatiye der de- ji bilî hin kêmasiyên ku li vir an li wir hatine der- cîbicî bûn û komîsera bilind jî bi erk û stubarîyên xwe rabû. Di.........2

# Gişpirsî... Serkeftina Wekheviyê Bû!



Li ser biryara piraniya hêz û partiyan, li roja 25ê miha Rezberê gelê Herêma Kurdistana Îraqê çû ser sandiqan û dengê xwe ji bo gişpirsiya li derbarê pirsa serxebûna Herêma Kurdistanê da. Li gorî encamên fermî, nêzî %73 ji xelkê Kurdistanê çû ser sandiqên dengdanê, ji wan jî %92.3an ji serxwebûna Kurdistanê re gotin ((belê)).

Li gora nêrevanên bêlan, rapirsî bi şêweyekî azad û demokrat derbas bû, xelkê Kurdistanê û deverên nakober jî bê zor û asteng dengên xwe dan û çarenûsa pêşeroja xwe ji raya cîhanî re dane nasîn.

Ev çara yekê ye ku gelê Kurd diçe ser sandiqên dengdanê û nêrîna xwe di serxwebûna welatê xwe de bi rengekî aştiyane dide; lewre jî rapirsî û encama wê li seranserî Kurdistanê û cîhanê deng veda û bû ciyê dilşahî û pîroziya gelê Kurdistanê li her çar aliyên welêt.

Lê li aliyê din, rapirsî û encama wê ji dewletên derdora Herêma Kurdistanê, Tirkiye, Îran û destlata li Bexdadê jî bû pirsgirêkeke mezin û ne hate pejrandin. Gefûgurên giran ji hêla raydarên wan dewletan de li kurdistaniyan hatin û têne kirin û bi.........2

# Ji Jiyana Rojane!

Di van rewşên şerên awarte de, gelek warên xizmetguzarê yên bingehîn ziyan dîtin, karûbarên wan rawestin û têkariyên neyînî li jiyana xelkê ya rojane kirin. Ji wan warên ku bêtir ziyan dîtine û bi pêwîst e ku guhdaneke baş pê bibe, pirsa rê û kolanên kantonê ne. Ji ber ku piraniya rê û kolanan kortekêrtî bûn, û hatine kolan û arîşeyên rastîn ji jiyana rojane û karêbarên xelkê re çêdikin.

Pir baş û ciyê dilxweşiya xelkê bû ku îsal şaredariyên kantona Efrînê, rewşa durustkirina hin rê û kolanên sereke qîr.........4



# Em li piroja sûriyeke demokrat û nenavendî bibine xwedî

## Pîrozname



**Ji dîwana kargêrî ya civata şêwrê ya kongira netewî ya Kurdistanî re**

**Beşdarên birêz ...**

Silav û rêz, digel hêviyên me yên gerim bona serkeftina vê civata we ya dîrokî ku li ser vê xaka pîroz li Rimêlana cî û warê Kurdan li bakurê Sûriyê tête lidarxistin. Herweha bawerî li cî ye, ku berhemên civata we, dê li gor giringî û pêdiviyên têkoşîn û berxwedana tevahiya gelê Kurd bin, û qonaxa ku gelê Kurd li Sûriyê tê re derbaz dibe ciyê rawestinê be, bi hêviya ku em tev mil li mil li piroja sûriyeke demokrat û nenavendî bibine xwedî û di çerçewa yekîtiya wê de mafên me yên netewî bêne naskirin. Lewre jî, bi her hawî ji rola yekîniyên parastina gel YPG – YPJ, herweha li hêzên Sûriya demokratîk, em tev alîgir û piştgir bin, bona dostanî û biratiya gelan, bona aştî, azadî û wekheviyê.

Careka dî bi navê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, em lidarxistina vê civatê pîroz dikin û serkeftinê jê re dixwezin.

Efrîn 30.09.2017

**Birayê we**
**Mihyedîn Şêx Allî**
**Sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

**Gişpirsî ... Dûmahîk**

dorpêçkirin, birçîkirin û şer tê gefkirin. Helwestên gelek dewletên din jî ji rapirsînê neyînî bû, wan dixwast rapirsî di vê demê de li dar ne keve. Wek dibêjin, ew pirsa şerê li dijî terorê didin pêş û metirsî ji hevxistina hevpîvana siyasî û sînorî ku ji sed salî ji dema lievkirina Seykês-Bîko de li herêma Rojhilata Navîn heye were parastin, netê guhertin, tu dewlet Kurdî ava nebin û nexşeya herêmê ji hev neşele.

Erê rewşa Rojhilata Navîn di tevlîheviyeke mezin de ye, aramî tê de kêm bûye, şerê li dijî teror bûye pirsa yek ji dewletên mezin, Netewa Yekbûyî û raya cîhanî re jî, lê belê destê gelê Kurd di peydakirina wan arîşeyan de tuneye û jê re nebûye eger û jêder, li bervajî wê çaresernekirina rewşa gelê Kurd wê zemîneke lêhatî ji hemî cureyên nedadî, setem, şer û terorê re jî ava dike. Lewre jî, ji mafê gelê Kurd e ku piştî ewqas qurbanî û têkoşîna sedsalan li doza serxwebûna wî mikûr were û ji mafê serxwebûnê bêpar nemîne.

Lê digel hemî helwest û bertekên neyînî û (arînî) ku sebaret daxwaza gelê Kurdistan Îraqê ji rayedarên dewletên cîranên Kurdistanê derdikevin û digerin, lê xwedanên wan helwest û bertekan baş zanin û têdigihên jî ku rapirsî bi xwe ne biryara serxwebûneke yekser e, rapirsî tenê nêrîna xelkê Kurdistan dide nasîn, ew derî li pêş guftûgoyên demdirêj bi destlata Îraqê û hemî dewletên navçê, cîhanê û Yekîtiya Netewan re jî vedike û ne wekî hinek dibêjin ku ew egera dadana şer û nakokiyên tund e!. Pêkanîna encama rapirsiyê jî wê li gora rewş û ecamên wan guftogoyan werin nasîn û danîn.

**Hilbijartinên... Dûmahîk**

warê asayîşî de jî, hêzên parastinî bi rolên xwe rabûn û nehîştin tu bûyerên kambax bibin, wê yekê hîşt ku hilbijartin bi şêwakî aştiyane derbas be. Jixwe çûna ser dengdanê de ji bo vebijartina namzetên lêhatî, di asteke bilind de bû, dûrî pîvan û texmînên hemî aliyan bû, tabloya hilbijartinê xemiland, dewlemend kir û ciyê şanazî û serbilindiyê bû.

Yanê mirov dikane bibêje, ku heyama vê hilbijartina derbasbûyî baweriya xelkê me bi hilbijartinan zêde kir. Ev pêngava erênî ya çûyî dibe bingehek ji hilbijartinên werin re, çi ya 23.10.2017an û çi jî ya 18.1.2018an, da ku bibine nameyên erênî ji dostan û xêrnexwazan re jî. Çimkî, ev hilbijartin û dagirtina sîstema F.D.B.S, serkeftina gelê Sûriyê bi tevayî ye, netenê bakurê Sûriyê û herêmên kurdî.

# Capanî Û Sûrî!

**Mislim Şêx Hesen**





Di sedsaliya bistemîn a şerê cîhanê ya yekemîn 1914 – 1916 an û şerê duyemîn 1939 -1945an de, rûdan û her du cengan ziyan û wêrankirineke bêhode bi cîhanê kir, gelek dever û bajar şewitand û rûxand û rewşa hin welatan zor kambax û dijwar kir, nexasim Welatê CAPANÊ ya ku di cenga duyemîn de du bajarên wê HÎROŞÎMA û NAXAZAKÎ di 6 û 9 î Tebaxê 1945 an de ji aliyê balefirên şer ên Emerîka ve bi çekên OTONOMÎ hatin bombebarankirin û jiyana mirovî û giyanwerî li wan her du bajaran qir bû, bi ser da bobelatek mezin bi CAPAN bû, lewra jî ew welatekî wêrankirî ji şerê cîhanê yê duyemîn derket. Lê vîna gelê CAPAN ya xort û sîstema demokrat a zagonsaz û yasa rêk li pêşiya gel hêsan kir ku welatê wêrankirî ji nû ve ava bikin. Lewra jî bi coşek bilind komara Yapan a demokrat û ligel vîna gel karibûn di demek kurt de ew welatê ku wêran bibû, bikin welatekî herî li pêş di hemû waran de. Vêca CAPAN niha ji her hest welatên herî dewlemend di cîhanê de tête jimartin. Ji bilî ku di rêza welatên herî li pêş de ye di warên pêşesazî û şaristaniyê li cîhanê.

Di heman demê de komara SÛRIYÊ jî li 17 / 4 / 1946 an ji bin destê Firensa rêzgar bû, serbestiya xwe wergirt, lê belê gelek desthilatdarên wê înqîlabên leşgerî ku li pêy hev kirin, ew hemî jî rêvebirîne di kar û barên xwe de ne birêkûpêk bûn û roj bi roj rewşa Sûriyê aloz û astengkirin, rê li pêşiya demokratiyê birîn û berjewindiyên xwe parastin.

Lewra jî, karbidestan ti gavên pêşketinê nikaribûn bavêtana, ta partiya Behis di 8 Avdarê 1963 an bû desthilat û siyasetek zor dijwar û tund li gor berjewendiyên xwe bikaranî, jiyana yasayî li Sûriyê raweştand û herwiha hemwelatî ji hemî mafan bê parkirin. Ji bilî ku zordarî û pirojeyên nejadperest dermafê netewa Kurd bikaranîn, gelê Kurd ji hemû mafan bêpar kir û bi ser de rewşa aborî, rêzanî, civakî li seranserî welêt kire astengiyan. Lewra jî xeleka birçîbûn û xizaniyê di civaka Sûriyê de roj bi roj ferehtir bû, û bi domkirina demê re bû desthilateke dektetor. Loma jî şoreşê ji bajarê DERAYÊ de li dijî rêjîma sitemkar û xwînî dest pê kir. Ji ber wê jî bi sedan gund û bajar hatin wêrankirn, ji bilî ku bîtrî 500 hezar kes hatin kuştin û nêzî milyonek girtî û windayî, milyonek birîndar û 12 milyon jî penaber bû. Rêjîmê dixwest û hîn jî dixwaze ku bi tena xwe li welêt desthilatdar be Sûriyê kire welatekî herî paşketî û jar di cîhanê de.

Vêca mirov kare bêje çiqas cudahî di navbera welatên ku bi riya demokratiyê û yasa û yên ku bi riya dektetoriyê rêvebiriya wan dimeşe heye; ji ber ku Capan û Sûriyê di heman demê de rewşa wan yek alî bon, yek wêrankirî ji cenga cîhanê ya duyemîn derket û ya dîtir jî, ji bin destê dagirkerên ferensa derket, vêça gava ku tu her du welatan beramberî hevdu dikî, çudahiyek gelekî mezin xuya dibe, yek berhema sîstema demoqrasiyê û ya dîtir jî berhema sîstema dektetoriyê ye.

# Gişpirsîya Kurdistana Îraqê û Federaliya Bakurê Sûriyê

**Qaziqlî Muhemed**



Biryara gişpirsiya Herêma Kurdistanê ya ji bo serxwebûnê ne jixweberê hate dan. Ew maf li gor biryarên Komîteya Miletên Yekgirtî û belge û gerdîşeyên navdewletî ji mafê her miletekî ye. Lewre bo gelê Kurd jî mafekî rewa ye, û ji mafê wî ye jî ku bi xwe çarenûsa xwe binivîse.

Ji bilî ew mafdariya bingehîn ji bo gişpirsiyê, sedem in din jî hebûn hîştin ku rêvebiriya Herêma Kurdistanê û gelê me li wir neçar bibin ku berê xwe bidin gişpirsîyê. Ji wan sedeman cîbicînekirina benda (140)î ji Destûra Îraqa Federal, qutkirina baceyên karmend û pêşmergan û çaresernekirina pirsgirêka petrol û gazê ji aliyên hemî hikometên ku li dû sala 2003 an hatine û çûne ye.

Sebaret Federaliya Demokrat a Bakurê Sûriyê jî, ew weke çareseriyeke siyasî ji bo hemî pêkhateyên ku li vê herêmê dijîn û bi taybetî jî gelê me yê Kurd û ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê bi tevahî hate pêşkêşkirin. çinkî hemî rê li pêş......... 7



# Partiya Yekîtiya Demokrat PYD kongira xwe ya heftemîn lidardixe

*Li dawiya miha Rezberê Partiya Yekîtiya Demokrat PYD kongira xwe ya normal li bajrokê Rimêlan li navça Cezîrê li dar xist... bi wê boneyê partiya me Partiya Yekîtî Ya Demokrat A Kurd liSûryê nameke pîrozbahiyê ji kongir re hinart, û serkefti û pêşketin ji karûbarên partî û kongirê wî re hêvî kir.*



## Pîrozname

Komîta amedekar a kongireya heftemîn a Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD). Mêvanên birêz.

Li destpêkê, bi navê Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ), em girêdana vê kongireyê pîroz dikin, bi hêvîne ku li ser rêya xebat û têkoşînê, ji bo berjewendiyên gelê me, ew biriyarine mifadar wergire. Li ber çavan e ku kongireya we di merc û demeke taybet de li dar dikeve, di wê demê de ku Paytexta rêxistina terorîst (DA'IŞ) li ser destên Hêzên Sûriya Demokrat a ku şervanên YPG û YPJ ji hêzên wê yên sereke ne, hate rizgarkirin, sîstema fidral li bakurê sûriyê li dar dikeve û çeteyên tarîxwaz li Başûr jî li ser destên Pêşmerge hatin şkandin. Ji hêleke din ve, serkeftina giştpirsiya li Başûrê Kurdistanê ya ku berî du rojan birêveçû ji bo tevaya gelê Kurd destkeftiyeke mezin û pîroz bû. Ji ber ku gelê Kurd yê aştîxwaz tiyê azadiyê ye, li her çar parçeyên welêt û li welatên biyaniyê, bi coş û dilgermî banga serxwebûna Kurdistanê hembêz kiriye û bê dudilî jê re kar û xebat kiriye.

Ji hêla din ve, ji ber avêtina van gavên pîroz, rijêmên zikreş û xêrnexwaz li Tirkiyê, Îran, Îraq û Sûriyê dîn û har bûne, civînên aşkere û veşartî li dijî mafên gelê kurd yên rewa li dar xistin û hê jî li dar dixin, gefan li me dixwin, û dixwazin bi dek û dolabên xwe van serkeftinan beravêtî bikin, lê em bawer in ku ewên di van kiriyarên xwede têk biçin.

Xwişk û birayên xoşewîst... Di baweriya me de, bersiva rasteqîn li pîlan, dek û dolabên neyarên azadiya gelê me, yekîtiya hêzên me yên siyasî ye, ewa ku payedariyê dê bide civaka me, û roja rizgarbûna gelême nêzîktir bike. Pêwîst e ji bo doza gelê me, ji bo pêkvejiana gel û netewan, em dest bidin hev û bi dilsozî tê bikoşin. Careke din serkeftinê ji kongireya we re dixwazin.

Gelek spas ji guhdariya we re.

27. 09 2017.. Z

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ)**

**Ji jiyana ... Dûmahîk**



kirin. Bi rastî ew karekî berçav e ku îsal hat kirin û ciyê spasiya şêniyê kantonê ye.

Ji bilî pirsa durustkirina rê û kolanan, pirsgirêkine din jî hene, wek peydakirina eletrîkê. Ew jî mijareke pêwîst û giring e. Çinkî ev bûne pênc sal ku eletirîka tora giştî ji ser kantona Efrînê hatiye birîn û xelk li ser eletrîka matoran jiyan û karûbarên xwe derbas dike. Ji bilî pere û buhaya ku malbat û karxane didin, ew têkariyeke neyînî ya giring li ser gelek warên jiyana her welatiyekî dike. Zor pêwîst e ku çareseriyeke bi lez û kokane ji pirsa peydakirina eletrîkê re were dîtin, da ku jiyana mirov û civaka me hêsan û normal bibe û çerxa aboriya navçê jî baştir bigere.

Bila em ji bîr nekin, bixizmetguzariya baş û guhdana bi jiyana xelkê ya rojane Rêvebirya Xweser bêtir ciyê xwe li ba xelkê digire û bi ser dikeve. Pir giring e ku ji bilî pêkanîna ewlehiyê, tiştên ku bi jiyana xelkê ya rojane ve girêdayî ye ji bîr nebe û kar bibe ku ew jî peyda bibin.

# Apê Os

Vejîna Kurd

Li deşta gundê me ya sîngfireh, xwezayê destên xwe bi heft avan şûştibûn û tajanên jiyaneke nû didan xwe. Ew ji bin zora serme û seqaya zivistaneke tund û dirêj hêdî hêdî hişyar dibû. Pelên daran ên nûzîldayî xwe ji ramûsanên tavê re amade dikirin û bilbil vedixwendin simfoniya eşq û evîniyeke bê hempa. Apê Os li ser danişteka xwe rûniştibû lê ew tabloya xweşik qet bala wî nedikşand. Bi tiliyên xwe yên ku ji nivîsandinê westiya bûn cixare dixiste nav lêvên xwe yên terikî û bi xelekên bîranînên xwe diponijî.. Apê Os mirovekî zana, rewşenbîr û kurdperwer bû, berî çar salan, babelîska koçberiyê ew, hevjîna wî û her du zarokên wî li dewleta Almaniya bi cih kiribûn, keça wî, Kurdê, ya ku tu qedir û qîmet ne ji wateya navê xwe û ne jî ji gotin û şîretên bavê xwe re girtibû, ji xortekî Efxanî hez kir û vê re çû. Lawê wî jî bi keçeke Elmanî re zewicî û niha zarokekî wî heye lê ew bi zimanê kurdî nizane biaxive. Apê Os gelek ditengijî, ji ber ku ked û perwerdeya bîst û pênc salan bi agirekî re bûn xwelî û di lehiyekî de winda bûn. Rewşa zarokên wî ya kambax tehlî dadirivand giyanê wî û diranên êşan di dilê wî re diçikandin, êdî ew neditebitî û herdem bi hevjîna xwe re digot: Malavayê! Jiyana biyaniyê dawiya wê tenê malwêranî û poşmanî ye. Tiliyên felekê birizin, me ne dost û heval ne jî milk û mewal, va ye me her du zarokên xwe jî winda kirin, were em vegerin welatê xwe berî ku temen ji destên jiyanê difilite û dikeve. Lê hevjîna wî bi jiyana derewîn hatibû xopandin û razî nedibû vegere.



Li destpêka zivistana borî, me dît ku ew bi tenha xwe di nav me de ye. Tenê hêviyên têkçûyî û ariya du hezar rojên jibîrkirî di çentê wî de hebûn, rondikan di çavên wî de li ber xwe didan lê nediherikîn û herdem bi xwe re digot: Çi xewneke tehl bû looo!! Piştî demekê wî deriyê dibistana gundê me ji nû ve vekir û dest bi karê mamostetiyê kir, zarokan pir jê hez kirin û di xwendinê de pêş ketin. Ez pir diçûm serdana wî, pirtûkxana wî ya ku pirtûk mîna serbazên yekîneyeke leşkerî li dû hev rêz bûbûn û hin ji wan pirtûkan berhemên pênûsa wî ya xedar bûn, wan pir bala min dikşand. Dema wî dît ku ez li pirtûkan pir dimeyzînim bi min re got: Kuro! Rûpel zevîyine xam in, mirov hizir û ramanên xwe li ser dipexşîne, bi hestên xwe av dide, carina şahî zîl didin, carina jî bîranîn û birîn şîn tên.. Min got: Erê apo; min dîwana te ya dawî xwend, di hinava wê de pêtên xem û êşan xuya bûbûn, û dema min li kûrahiya wan nêrî, min siwarekî birîndar, bê rim û mirtal dît, lê mûmên vîna wî hertim geş bûn, tariya jiyanê nikanî roniya wan bipêça û di xwe de noq bikira. Wî simêlên xwe badan û bi vîn û bawerî got: (Belê kuro! Komkujiyên ku di hindur me de çêbûne zincîr li lingên me gerandine û daristan di çavên me de hişk kirine, dilê min di çar salên dojehî de bû komir û hîn xeyala malbata min xwe ji ber çavên min nade alî, lê ez bawer im, ku çendî şev reş, tarî û dirêj bin, roj wê dîsa hilê û tîna êşan ko bike. Bila tu zanibî nivîsandin di wî agirî de zozanek ji hênkahiyê ye, û berhemên pênûsê di wê wendabûnê de taveheyv e, her ronahî û hêviyan geş dike. Kuro! Min nikanî zarokên xwe biparastana, lê ezê hemû zarokên gundê xwe perwerde bikim û tovên evîna welêt di dilê wan de biçînim, ezê çîroka xwe ji wan re binivîsim heya pênûs di nav tiliyên min de xulmaş dibe. Tenê serkeftina wan zora min dibe…..). Axaftinên me mîna morîkên tizbiyan li pey hev rêz dibûn û peyv û hevok xweş dibûn, li aliyê gund ê din jî xecxecokan nameyên buhareke xweş, rengîn û têrhêvî dixwendin.

# Goçer Doskî ... Pêşmerga Leheng



Li roja 19 miha Rezberê Saziya Yekîtiya Netewan bo Çand û Zanistê "UNISCO" ji bo rola şervana Kurd pêşmerge Goçer Doskî di şerê li dijî terora DAIŞÊ de ew vebjart û xelat kir. Xanin Goçer çar salan di Ekadîmiya leşgerî de li Zaxo xwendiye, fêrnama Bekeloryos di zanînê leşgerî de bi dest xistiye û bi pileya"Milazim" derçûye.

Pêşmerge Dosky ji mediyayê re wiha got: "Ez serbilind im ku ez ji şervanên jin ên despêkê bûm ku çûm eniya çerê DAIŞê… Ez serbilind im wek kurdekê ku min ev xilata wergirt … Wateyeke mirovî ye giring a vê rûmetkirinê heye… Ji bo rapirsiyê jî, me ewqas qurbanî û xwîn daye, pêwîst e tiştê ku me dayî encam bide û………. 7



# Mirov Bi Zimanê Xwe Bi Ser Dikeve

Nazdar Hesen



Bi hilkeftina demsala Payîzê û destpêka meha Êlûnê, hemû sazî û dezgehên perwerdeyê li cîhanê dikevin liv û tevgerê. Xwendekar jî bi dilekî şad ji vebûna dibistanê û destpêka saleke xwendinê ye nû re xwe amade dikin. Wiha Rêveberiya perwerde û fêrkirinê li Rojavayê Kurdistanê jî ev sê - çar sal in ji bo xwendekarên xwe fêrî zimanê Kurdî bike, bi hemû kanîna xwe hewil dide, zimanê ku bi salan hatiye qedexe kirin, ji nû ve vejîne, geş bike û bi awayekî fermî li dibistanan bide xwendin, ji ber vê yekê jî peymangeh û zanîngeh vekirin, rêbazên hînkirinê tev guhartin, pirtûkên nû çapkirin, bi hezaran mamoste li ser fêrkirinê bi zimanê Kurdî perwerde kirin û li dibistanan belav kirin. Belkî, ev gava pîroz di destpêkê de bi lez bû û bêyî ku jê re were amadekirin hatibe avêtin, yên li ser amadekirin û çêkirina wan rêbazan ne kesên pispor bûn û piraniya mamosteyan ne di asta mamostetiyê de bûn, loma jî wan tiştan bi xwe re gelek astengî û şaşîtî anîn holê, lê ev nayê wateya ku ta niha em bi dudilî û sarbûn bi xwedina bi zimanê Kurdî bigirin, an em dijberî vê guhartinê bisekinin, zarokên xwe neşînin dibistanan û li benda vegera rêbaza xwendina berê ya rijîma dewletê bimînin; an jî em di rewşeke qaşayî de bin ta çarenûsa van xwendekaran xuya dibe û dewletin mezin lê mikur der dikeve, yan jî ev yeka bibe sedem ku em herêmên xwe bihêlin, ber ve bajarên ku dibin destlata dewletê de ne koç bikin. Ev diyardeya jî ji demeke berçav bûye, ger berdewam bibe, wê encamine neyînî pir li ser civaka kurdî bike û bibe kêşeyeke bi tirs, ji ber vê yekê jî, gerek e em baş tê bigihên û bawer bin ku mirov bi zimanê xwe bi ser dikeve û pêş ve dere, helbet jî destpêka her karekî astengî û şaşîtî jî hene, lê ew bi demê re tênê çareserkirin û ger em bi xwe xwedî li zimanê xwe dernekevin û ji ber ve ne xebitin, bila em li benda tukesî jî nemînin ku li zimanê me mikur werin. Wek mîr Celadet gotî: Kurdino malxerabino an nebêjin em kurd in an jî bi Kurdî bixwînin, binivîsin û biaxivin.

# Tenê Weke Kurdekî Dinivîsim…

Zozan Ebdo

Tevî dizanim ku tu peyv nikarin mafê wê bidinê, lê dîsa jî dixwezim vê carê li ser welatê xwe binêvîsînim. Kurdisatan...narîn e, ciwan e, dijberî hertiştekî ye, ku her solava temenê wê diherikeji dêvla ku pîr bibe her diçe ciwantir û spehîtir dibe. Ji tiştekî natirse, lê belê hertiştek tirsa wê dike.

Ji demên berê de welatê min lehengeke bi serfirazî li ser balgiyê dîrokê pal vedaye. Belkî hinek ji ber ziraviyên rûyê wî dişibihe awazekî ku tu biafrînî, lê di encamê de ji xweşikbûna wî awazî tu nizanibî çawa lê bidî?!!... KURDISTAN... ne perçeyek ji zemînê ye, ew perçek e, ji erdheja bûhiştê ketiye ser rûyê erdê. Ji wê rojê de, û ji ber ku ew ji buhiştê ye, tenê xwîna şehîdên wê û hêviyên gelê wê yê berxwedêr, efsanên dîroka wê vedibêjin. Di vê cîhanê de, di qada şer de jî, gelê ku tucarî ji ber mafê xwe ve fedî nake gelê wê ye, gelê KURD e. Wisa roj li ser xaka wê, bi xwîn, nalîn, şer û encamên serkeftin yan binketin derbas dibin. Pirî caran Kurdistan ji xeta serxwebûnê nêz dibû lê mixabin ji ber gelek sedeman wisa ew nêzîbûn bi encamek serbilindî bi dawî ne dibû. Heta vê rojê jî wisa diqede, lê belê rewş hatiye guhertin, êdî roka rastiyê hiltê û dê buharek buhiştî bibişkuvîne. Va ye îro xewna ku bav û kalên me pê hêvî dikirin, di rastiyê de nema xwen, êdî rastî iye. Divê Kurd li hemî cîhanê yek bin. Bila di zivistanên pêşerojê de, çîrokên me yên li derdora agirdanka êzingan li ser roja azadî û serxwebûnê bin. Îro tenê weke kurdekê ez dinêvîsim, dûrî partiyan, siyasetê, erdnîgariyê, dûrî hertiştî.... Tenê weke kurd dixwezim :

**KURDISTAN Bibe KURDISTAN**

# Belgeya Bingehîn a Encûmena Gişpirsiyê li Kurdistana Îraqê

Di civîna Encûmena Bilind a Gişpirsiyê de li Kurdistanê, belgeyek bingehîn ji bo çawahiya destlata Kurdistana serbixwe hate belavkirin. Di belgeyê de mafên hemî pêkhatiyên ku di nava axa Kurdistanê de dijîn hatin nasîn û dê di riya sazûmana federal re werin parastina. Ji ber giringiya wê belgnama bingehîn emê wergera wê diweşînin.

((Belgenameya rêzanî ji bo misokerkirina mafên pêkhateyên netewî û ayînî li Kurdistanê.

Em endamên encûmena bilind ya gişpirsînê ne li Kurdistanê, wekî em nawer ku Kurdistana Îraqê welatê hemiyan e ji Kurd, Tirkman, Kildan- Siryan- Eşûr, Ereb û Ermen, ji Miliman, Êzdî, Fileh, Kakaî, Cihû, Zerdeştî, Sabîe Mendaî û Şebek….. Lewre jî me biryar da ku têkliyên di navbera dewletê û pêkhateyan de li van bingehan durust bikin:

Belgenameya siyasî bo parastina mafên hemî pêkhateyê netewî û olî li Kurdistanê

**Bend(1):** Em ji pireregiya netewî, olî, bineolî û çandeyî ya civaka kurdistanî erê dikin, mafên hemî pêkhateyan li seer rêgeza welatînî û û wekheviyê diçepînin, taybetiyên olî û bawermendî, pêkanîna rewresm û gerdişan û malê perestvaniyê diparêzin û xizmet dikin.

**Bend(2):**

a. Mafên netewî, çandeyî û Îdarî yên Tirkman, Kildan-Siryan-Aşor, Ereb û Ermenan diçespînin, ji şêweya rêvebiriya xwesr, nenavendane û ta digihê federaliyê li navçeyên dîrokî yên wan pêkhateyan li gora serjimara sala 1957an.

b. Mafên pêkhateyên Êzdî di rêvebiriya xweser, Destlatdariya xweser, nevendane û ta digihê federaliyê li navçeyê ku piraniya wan Êzdî ne diçepînin, ew jî bi zagon tê lisazxistin.

**Bend(3):** Nûnertiya dadmend a pêkhateyeyan di encûmenên hilbijartî, dezgehên îdarî, saziyên diplomasî û desteyên serbxwe de were kirin, ew jî bi zagon durust bibe.

**Bend(4):** Pêkhateyên netewî û olî di dadgeha destûrî ya bilind de, li gora asta zanînê ku li gora zagonên giştî tê xwastin, were misokerkirin

**Bend(5):** Nûnertiyeke pêkhateyan a dadmend di saziyên pêkanînê, postên serwerî, sîstema berevanî, hêzên asayîşa navxweyî û hêzên pêşmerge de li gora zagonên ku bikar tên were çespandin.

**Bend(6):** Zimanên kurdî, tirkmanî, siryanî, erebî û ermanî wek zimanê birin. Ew jî bi zagon werin lisazxistin.

**Bend(7):** Ala Kurdistanê, dirûşma wê û sirûda wê ya niştimanî distnîşana pêkhateyan bike û bi riya zagonê were lisazxistin.

**Bend(8):** Cejn û boneyên natewî, olî û rawstanê fermî yên pêkhateyan bi şêweyek zagonîwerin durustkirin.

**Bend(9):** Dewlet azadiya baweriyan û lidarxistina rêwresm û karûbarên olî ji bo hemî pêkhateyan diparêze.

**Bend(10):** Sebaret pêkhateyên olî yên ne misliman, ji bo karûbarên kasane zagonên xwe yên taybet di riya dadgehên xwe yên taybet re bi kar wînin, û şerûmercên olekî li olekî din ne tê sepandin.

**Bend(11):** Guhertinên dîmografî li navçeyên dîrokî yên pêkhateyan li gara serjimra 1957an û ji dema ku dewleta Îraqê hatiye damezrandin de werin durustkirin û qedexe bibe, zordarî û hikariya qirkirin giştî ku Kurdên Êzdî, Kildan-Siryan-Aşorm Tirkman û û hemî pêkhateyên din ku werin hilanîn, navçeyên ku tûşî wêrankirinê bûne werin avedankirin û berdêla ziyanên ku gihîştinê bidinê.

**Bend(12):** Mafê pêkhatiyan bo damezrandina encûmen, pevgirêdan, komele, rêxistin û Yaneyan were misogerkirin.

**Bend(13):** Dewlet parastin û vejandina cigehên kevnerêçî, şaristanî û olî yên hemî pêkhateyan li xwe digire.

**Bend(14):** Dîroka pêkhateyan, têgehên lêborînê, pejrandina aliyên din, mendelkirina çanda neret û cudawaziyê û her tiştê ku dajo ser tundîçiyê di raman û kar de di rêbazên perwerde û fêrkirinê de werin danîn.

**Bend(15):** Nûnerên hemî pêkhateyan di darijtina destûr de beşikdar bin.

**Bend(16):** Bendên vê belgeyê di civîna perlemana Kurdistanê ya yekem depiştî çalakirina wê- were cêbecêkirin…

**Wergerandin ji erebî: Rozad Elî.**

**Gişpirsîya Kurdistanê ... Dûmahîk**

gelê Sûriyê hatin girtin, û hate çespandin û tekezkirin ku rijîm û sîstema navendane sersebeba anîna kirîz, zilim, zor û bobelata ku li Sûriyê bûye û dibe. Ji ber ku sazûmena Federaliyê bi xwe rengekek ji rengên sazûmanên nenavendî û demokrat e. Li pir welatên pirpêkhate hatiye cîbicîkirin, pirsgirêkên wan welatan kêmkirine û ew welat bi pêş xistine.

Ev guhertinên siyasî ku li Bakurê Sûriyê li saz dikevin, sergovendên wan Kurd in, serkeftina wan serkeftina tevahiya Sûryê ye. Lewre jî divê em nakokiyên nav xwe di vê dema zor hestiyr de bidin alîkî, milên xwe bidin hev û li gel hev ber xwe bidin.

**Goçer Doskî ... Dûmahîk**

em bigihên mafê xwe”.

Hêjayî gotinê ku gelek kesayetiyên siyasî yên Îraqî, Ereb û cîhanî ji gelek dewletan li ahenga xelatkirinê amade bûn û ew pîroz kirin.

Pîroz be ji pêşmerga leheng Goçer Doskî re, wekî ku bi erka xwe ya netewî û mirovanî radibe û serê gelê xwe yê Kurd û welatê xwe bilind kir.



# Belgeya Gernasên Kurd ji Serwerê Firensî re

## Zimanê Kurd di war û karûbarên dewletê de were pejrandin

Zor û setema ku li ser Kurdan dibe, ne ji îro û diho de ye, ew ji despêka damezrandina dewleta Sûryê, di bingeha avakirina wê û deslatdarên wê de ye. Mixabin! Careke tunekirin û mandelkirina hebûna gelê Kurd li Sûryê di mejiyê rayedarên wê de hatiye çane din, konik vegirtiye û kufkî kiriye!. Roleke dagîrkerên firensî jî di çandina ew ramana regezperest û nedadmend de hebû. Wê jî ji bo pêkanîna berjewendiyên xwe yên mêtingeriyê tiştê dixwast dikir û tiştê ku li ne berjewendiyên wê bû jî pişguh dikir û dipelixand. Roja îro Kurd ne tenê li Sûryê lê li seranserî welatê xwe bûne qurbana siyasetên dagîrkerên berê û mejiyên nijadperest ên deslatdarên gelek dewletên Rojhilata Navîn.

Piştî ku rêvebirya firensî li salên bîstan ji sedsala borî rews li Sûryê ji xwe re sar kir, dewletok, herêm û kantonine taybet ji gelek pêkhateyên Sûryê re ava kirin, wek dewletên Dirûzan, Elewiyan, Iskenderon, Şam, Heleb û hwd. Lê ji bo Kurdan tu qeware(kiyan) ne hatin avakirin, tu maf ne hatin dayîn, ne jî li mafên gel û mirovê Kurd mikûr hat. Ji ber wê helwest û siyaseta ne dadmend di tenga gelê Kurd re, xelkê Kurd li seranserî navçeyên xwe li Sûryê tûşî nedadî û zordariyeke ne mafdar a beloq bû. Ji ber Ava Reş de bigire li Roava ta digihê ber Ava Dîcle li Rohilat siyaseta puşguhkirina mafê Kurdan ê netewî dimeşî.

Loma jî li sala 1930 hejmarek ji gernasên gelê Kurd li Sûryê daxwaznamek ji serwerê Komara Firensa re li Sûryê hildan û tê de hinek mafên gelê Kurd daxwaz kirin. Ev e beşek ji wê daxwaznama dîrokî:



« Serwerê bilind yê Komara Firensî Hênrî Bonso (1926- 1933)»

*((Ji cenabê serwerê bilind yê Komara Firensî re li Sûryê û Libnanê… Rêzdar xudiyê serweriyê: Evên ku me li jêr binivîsên(Îmze) xwe danîne, em ji nijada Kurd in, ji xelkê herêmên ku di bin serweriya Firensa de ne. Em rûmetdar in ku van rastiyan li pêş we dînin: Ev welatê ku di bin serweriya we de ye û bi sedsalan di bin neguhdan û zordariya Tirkan de bûn, bi saya serweriya Firensa ji nêzîk deh salan de di serdemeke jinferehî û pêşketinê de dijîn. Ev encama xweş jî bi saya hişweriya Firensa bû, wekî ku wê rêvebiryên taybet li gora civak, gerdiş û têgihîştinên xelkê ne dane civakên siyasî,û ji pêkhateyên wan ên mezin de bigire ta hindikahiyên civakî û olî yên biçûk jî jê bêpar neman. Lê ji nav wan civakan, nijada Kurd a tekûtenê ye ku sûde ji ew karê şaristanî ne dî, digel ku ew hêjayî rêvebiriyeke taybet jî. Nijada kurdî ji regeza Arî ye, ew bi mêjû, çand, regez û zimanê xwe ji hemî civakên ku di çarçewa herêmên ku di bin serweriya we Firensa de ne, cudawaz e. Em ji cenabê we hêvî dikin, win ji bo herêmên ku bi Kurdan niştecihin rê bidin, ku em daxwazên dê pirsa careserkirina pirsa me li we sivik bikin dînin pêşiya we:*

1- **Were pejrandin ku Kurd di karên dewlet, rêvebiryê, warên dadweriyê, cendirme û asayişan de kar bikin.**
2- **Zimanê Kurd di war û karûbarên dewletê de were pejrandin**.

***Nav, salix û pîşeya binivîsan*:**

*Kamûran Bedirxan- parêzer, Celadet Bedirxan-parêzer, Sûreya Bedirxan- Endezyarê çandinê, Memdûh Selîm-Gernas û rojnamevan, Mistefa Şehîn- Serokê hoza Berazan, Hemo Mislim- Serokê hoza Pîcan, Bozan Şehîn Serokê hoza Berazan, Necîb Bermede- Gernasekî Kurd- Perlemanterê Hêrimê, Salih- Serokê hoza Dina, Qedrî Fuad Cemîl Paşa- Gernasekî Kurd- Endezyarê çandiniyê, Ehmed Melîk- Serokê hoza hoza Zirwarî, Mihemed Ferîd Cemîl Paşa- Gernasekî Kurd- Endezyarê Çandiniyê, Ekrem Qasim Cemîl Paşa- Gernasekî Kurd, Seîd- Serokê hoza Milan- Perlemnterê Qam mîşlê û Hisîçe, Haco- Serokê hoza Hevêrgan Hec Silêman Ebas- Serokê hoza Dorikan, Ebdî Mir`î Serokê hoza Aliyan.*

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**